

# ŞAR

- Qamişlo bajrê hevjiyaneke ciyewaz
- Azadiya sexte ya jinê
- Nakokî di navbera pêdîvî û bikaranînê de

1

Nîsan 2626

Qamışli  
Kido We

## Fehres

ŞAR gava xwe ya yekem diavêje	01
Azadiya sexte ya jinê	02
Hevpeyvîn bi Daryûs Derwêş re	04
Lêpîrsînek li ser rewşa beşê lêpîrsînan di rojnameyên rojava de.	07
Hêmin....şagirtê sirûdbêj	10
Qamişlo bajrê hevjiyaneke ciyewaz	12
Mirovanî bingeh û handera welatperweriyê ye	15
Sêmalka dergehê penaberî û zimanê kurdî	18
Tundûtijya li ser jinê	19
HELBEST	20
Sînema di şoreşa kolanê de	21
Koçberî û dorayiyên wê yên navneteweyî	22
Çalakiyên civîl	25
Nakokî di navbera pêdîvî û bikaranînê de	26

### Mehane û çandî ye. Guh dide kêşeyên aştiyê, û hevjiyan û karên sivil ên ku bi pevçûnê re tîn

Nivîskar berpîrs e di ber naveroka nivîs a xwe de, û Şar jî pabend e di belavkirina wan de, ji ber bi azadiya nerîn a ku ta ne sazane be bi siyaseta sernivîsê jî bawer e

Ji bo êandina pişkdarî, pêşinyar û pêwendiyê û belavkirinê parastîne ji

**info@shar-magazine.com**

Mafên çap û belavkirinê parastîne ji kovara ŞAR re



shar-magazine.com



info@shar-magazine.com



SharMagazine



SharMagazine


**Ji weşanên rêxistina ŞAR a geşpêdanê**



## ŞAR gava xwe ya yekem diavêje

Mijûlbûna bi tiştê ku dibe demek dirêj û êşek mezin dixwaze, û li ser pencereyên hêvîdariyê, perdeyên bi xwîn û bêhna barodê gemar bûne, û ji pişt cama wê ya şkestî ew şer xuya dike, ku çî mîkyac an birînkari wêneya wê bedew nake, ji ber ku ew buyerek e û ji armancên wê, tenê rengê reş, şewat û parçeyên laş xuya dibe.

Di çirava şer î mayînkirî de pêdîvî bi danheva kedan bêhtir dibe, qena tariyê derbas bikin û rêyin ji bêhnvedan û tevgerê re di nav dilxwazên aştiyê de bibînin ên ku gerewiyê li ser jiyana hevbeş bi yê dîtir î ciyewaz re dikin, ji ber divê dengê sivilî nizim nebe, û ew yên ku berîvaniyê di ber nixên hevjiyanê de dikin pêgehekê ji wan re bibîne, û derfeta tevger a wan berfirehtir bikin da giraniya vê nakokî ya xwînawe sivik bikin, ji ber çaxa ku bayê gerewiyên siyasî, leşkerbûyîn, û nakokiyên olî û regezperestî li bin guhê aştiya navxweyî û jiyana sivilan dikeve, rewş aloz dibe, her wisa kar di warê giştî de dibe celebê ji rûbirûbûnê re.



Hesko Hesko

Rojava, Cezîrê, Bakûr- Rojhilatî Sûryayê, Herêmên Kurdî, Kurdistana Sûryayê, Parêzgeha Heseke, Bêt Nehrên û navin din tîye bikarain bo destnîşankirina herêmên ku rengê şaristanî û pîneteweyî afirand, her wisa paşmayiyeke wê yî zengîn di hevjiyan û tîkiliyên xurt de di navbera pêkhatayan de heye, Kurd, Ereb û Suryan, ev tişt bi xwe diyardeya herî xuya ye di herêmekê de ku harbûna xwîn, serjêkirin û şerê ku aniha dibe cihê wê tune ye, û ev tişt li ser sîdewergirtina ji şaştiyên dîrokê hate avakirin, lewra pêvajoyê ber bi aştiya civakî ve diçe, tevî hemû hewildanên ku dibû da pêkhatayan berdin hev.

**Ev e herêma ku emê hajmarên kovara xwe yî çand î nû ya xwedî rêdana sivil (ŞAR) tê de belav bikin, ev herêm ji deverên herî amade ye ji bo karê sivil û ragihandinê di hundirê aloziyaya Sûryayê ya aniha de, her wisa daxwazê mezin li cem hemwelatîyên wê yên cihêreng heye da nîrên tiracîdî yên ku herêma wan û deverên din ji Sûryayê hatine dorpeçkirin derbas bikin, ji ber ew derbasî nakokiyên nijadperestî, regezperestî yan jî olî yên xwedî rewşeke giştî nebû, tevî ku gellek caran bibû armanc ji gellek aliyên re da şer û wêran tê de berdewam be.**

ŞAR nexwedî helwestek siyasî ye, lê berê xwe dide pêşkêşkirina wêneyek li ser jiyana mirov û nerînên wan, û veguhertinên civakî, aborî û ramanî yên ku bi nakokiyê re tê diyar dike. Her wisa hewl dide jî bo nîşandana nixên hevjiyan û lîborînê, û geşkirina tîgihîştin a tîgehên demokratîk, mafên mirovan, civaka sivil û bîngê wê, azadiya ragihandinê û hevbeşiya siyasî û civakî bo jinê. Her wiha balê dikşîne ser hemû tiştên

girêdayî perwerdeya sivilane û danasîna tîgehên dezgehî yên ku hişyariya sivilî dadimezrîne.

Aliyên jiyandarî û aborî bigiştî wê cihên xwe di kovarê de bibînin, her wisa dîtin û şopandinên rojnamevanên ciwan jî. Ji wêneyê re wê cihê wê yî vejîner di Şar de hebe, ji ber ku ew di heman demê de hestî kûr û bi lez dide û yê bîner dixê hundirê ramanê bêyî ti pêşgotinan. Wêje û huner nayên paşguhxistin çimkî her du robarin giring in bo tîrkirina wijdanê mirov û geşkirina hest û çêja wî.

Ezmûn di nivîsandin û sernivîskirinê de bi du zimanan, dibe ku westok be, lê karekî giranbûya ye û divaye bêje şopandin. Ji ber ku zimanê Kurdî li pêrgî tunekirin, paşguhxistin û astengkirin. Zimanê Erebî jî, ji bilî ku ew zimanê Erebî derve ye, ew bi xwe zimanê fêrkirin û çandê bû ya ku di hundurê xwe de rahişt çand, raman, wêje û rojnamegerî, digel arezûyêke kûr bo tevlîkirina ziman û abeya taybet bi pêkhatiyên Suryan û Aşûriyan ve çaxa derfet peyda bibe.

Hejmar yekem digel hilbijartin, dergeh û mijarên xwe wê bibe hejmareke bo ezmûnê, lewra em dê li benda tîbînî û rexneyên cemawerên bi rêz, nemaze kesên pispor ên ku em şanaz dibin bi nerînên wan. Li hêviya ku her kes hewl bide bo damezirandina çand a giftûgo û diyalogê ya ku zemîneke durist pêk tîne, dîrî biryardayînen tekezkerî yên ku em ji wan tengijî ne di rewşekê de ku reşkên mirinê tê de baz didin û bûye cihê wêran û vîzevîza gulleyan.

Sernivîsên kovarê

# Azadiya sexte ya jinê

Bêwar Birahîm

Jin di civatên piraniya welatên cihanê de, bûne serperîştên gelek cihên zîz û astbilind, digel vê yekê jî, jinên wan qayil nabin û bi hemû hêz û şîyanên xwe li ber xwe didin, da cihên desthilatdariya herî bilind weke serokatiya welatan bi dest bixin. Berovajî vê berxewdana bêhempa ji aliyê jinên wisa ve, azadiya sexte ya jinê li rojhilata navîn bê şerm xwe berz û eşkere dike. Çima azadiya sexte? Ji ber di piraniya hewldanên azadkirina jinê de li vî parçeyî ji zemînê tev bê encam in, sloganên ku bê kirin, an gotin hene, lê kar çolistana ji rewrewkê ye. Dibe ku sedem ji desthilatdariya mêr a hişk be, lê ne jin û ne mêr li sedema vê desthilatdariyê napirsin, a rast xwe naêşin in ku ta vê pirsê ji xwe bikin. Gelek caran ez li ber pirsê Sigmund Freud "Jin çi dixwazin" radiwestim. Bi rastî ez jî dikevim wê susretê, ka jin çi dixwazin? Gelo jîrbûn û zîrekiyê dixwazin? Rûdarî û desthilatdariyê dixwazin? Maleke gerim bi mêr û zarok dixwazin? Berbînî pir in, lê encama naskirin a daxwazên wê ne diyar in. Ji ber nenaskirina van daxwazan, piraniya mêran dikevin rav û dafikin nepenî, dema xwe şareza dibînin û li qaçilê derve yê zayinda jinê dikulib in û bê ramandin wî qaçilî dikin duruşm û li ser dilên pêvajoya azadkirin a jinê ve dadiliqînin.

Çi mirov be, bê ku em cudabûnê bikarbînin, ka jin e yan mêr e, ku bi çavekî ewarte li xwe mêze bikin û rê nede çavî din ku bi kêmanî ji dûr de lê temaşe bikin. Tekez, wê neynika zanyarî ya wî (wê) zingargirtî be, hingê ew bi xwe jî nema xwe dibîne. Em di sedsala 21 ê de dijîn û xwe qayil dikin ku azadiya gelek cûreyên jiyane me bidest xistine û di serî de, azadiya jinê, lê mixabin ku neynika me ji zingarê reştarî bûye û rastiya dirûvê me nema tê de xuya dike. Heger em kultura



xwe bikin nimûne, wê bi sedan dîmen xwe li ber çavan dîrêz bikin, dîmenên herî azad di derbirîn û behremendiya kultur a kurdî de di derbarê laşê jinê de hene, lê ew jîna reben "kezîzera xwedîya memikên gilover, mîna penîrê koçer, her dugvêşe av tê der" di Kîjan qoncika azadiye de dijî, ji wê serdema ku ev stiran tê de navdar bûye ta vê serdemê, ev "kezîkur" di bin nîrê çî agirî de jiyana xwe berdewam dikir? Gelo, berovajî wê, ger jinekê ev stiran bigota, wê çarenûsa wê çî ba? Gelo ji mafê mêran e ku li ser laşê jinê helbestan, vekolînan, roman û filman çêbikin..., lê ne ji mafê jinê bi xwe ye – em nabêjin li

ser laşê xwe biaxive- lê bikêmanî, li ser çiyayê wan êşên ku ji bin serê laşê wê li ser kezeba jîyan a wê hatine bicihkirin biaxive?.

Di civata me de, jin an serdest e, mêr li ber qels û lawaz e, yan jî bîndest e, û şevên wê bi hêsrên avdayî ne. Em xwe payebilind dikin û bi pozbilindî dibêjin, jin bûne bijîşk, parêzer, serfermandar, bûne û bûne....., lê dumahiya van bûneyan baskên şikestî ne li ber mineta sîk û sîberên mêran.

Dema civakê xwest hinekî ji gunehê xwe derbarê jinê sivik bike, di salê de

jê re cejnek terxand û ev roj bi sernavê cejna Jinê pîroz kir, lê bi vê kirinê guneh girantir bûn û pîrozbahî hate binpêkirin, ji ber terxandina rojekê ji jinê re, dîdevanê desthilatdariya mêran e û paşketina civakê ye. Çareserkirina pirsgirê a jinê û azadiya wê, ne bi terxandina rojekê ye, veqetandina vê roj a taybet bi jinê, jê re nabe dilxweşkirin, lê di bawerîya min de, ev yek dibe henekpêkirin.

Em di sedsala 21 ê de ne, hê jî xwîna jinê di serşokên şuştina namûs û şerefa mêran de diherike. Divê em li xwe mukur bîn, ku em hê jî negihane wê hevsengiya rast û resen di navbera jin û mêran de, ji ber têgihîştina me ji azadî ya jinê bi awayekî berovaj hatiye naskirin, jin ji kevîrê albeşk û hesinê pola hişkîr e û ji sira baye sibehê nermîntir e, lê jiyane hîn ew derfeta berfireh jê re amade nekiriye ku vê hişkbûn û nermîniya xwe di nav hev de bihûne û bike werisê rizgarbûna xwe ya rast û resen. Dibe ku destê jinê bi xwe di azadiya wê ya sextet de hebe, dema bê ramandin xwe dispêre siha mêran û mîna balendeyeke basikşikestî, jiyaneke bi minet û kolektî diqedîne.

Azadî di çarçoveya komeleyekê, yan partiyekê, yan rêxistinê û yan bajarekî de nabe azadî. Şert û mercên herî giran ku civat bitevahî vê azadiyê bipejirîne û bi hemû hêza xwe palpiştîya vejandin û parastina wê bike li himberî şepêlên nerînteng mîna Islam a radîkal, ku serê lîsta sezayên wê her dem jin û recmkirina we ye.



Mixabin û bi qasî dûrbûna ezman ji erdê, mixabin ku me azadiya qaçil bidest xistiye, lê azadiya aqil hema hema bi giranî me winda kiriye, rîya lêgera wê zor zehmet e, lê ne dewrebar e.



## Hevpeyvîn bi Daryûs Derwêş re

Endamê navenda Sûryayê ya Dadmedniya veguhezane-Mes'a

### - Dadmendiya veguhezane wekû têgehê tê çi wate yê?

Dadmendiya Veguhezane (DV) ji du xalên sereke çêbûye, yek jê: Dadmendî, ango ew karên ku bihêlin yasa bi xwe serdest be di dewletê de, ne karên ku mirov bi xwe mafên xwe bidest xîne. Ya din: veguhezandin ji rêçîma dîktator ber bi rêçîmek demokratîk ve.

Têgeha fermî ya Dadmendiya Veguhezane li gorî Navenda Navdewletî (ICTJ) ev e: Komêk ji pîlanên dadwerî û ne dadwerî yên ku dewletên cihêreng pêk anîn, ji bo çareserkirina kiryarên bînpêkirina mafên mirovan ên ku hatibûn kirin. Ji wan pîlanan, şopandina dadwerî, komîtên rasteqîneyê, programên çaksazkirina dezgehên.

Wateya vê têgehê tîye xuyakirin, çaxa ku bînpêkirina mafên mirovan ji demê dirêj ve çêdibe, yan jî bi rengekî berfireh li dijî miletekî tê kirin. Di vê demê de kesên ku beşdarî kiryarên bînpêkirinê bûne gellek in, û dadgeh bi tena xwe nikarin çareyekê bibîne. Ne tenê ev, lê ji ber ku li cîhanê bitevahî çaxa siyasetmedarên her du aliyên nakokiyê dîghêjin peymanek siyasî ji bo rawestandina pevçûnan, mafên kesên ku bûn qurbanan wê pevçûnê wînda dibin. Ji ber vê yekê jî, (DV) kar dike ku mafên wan kesan were bidestxistin, lê dibe ku bi rêyin ji bilî dadgehên be jî.

### - Çi pêwîstiya dadmendiya veguhezane ye?

Pêwîstiya (DV) ew e ku bîghêje lihevhatina niştîmanî, tevî ku daxwaza (DV) ne tenê ev yeke, lê em guman dikin ku tenê (DV) dikare bîghêje vê armancê, ji ber:

(DV) tenê dikare li ser mafên kesên ku bûne qurbanan pevçûnê raweste, û xebatek zanistî û karêger di ber de bike, di rêya rêxistinên civaka sîvîl re -dengê kesên jar û bêhêz- ên ku bûn qurbanan nakokiyê.

(DV) tenê dikare li ser dirustkirina asayîşin nû kar bike, bi rengekî ku carek din ew bînpêkirinê berê yên di derbarê mafên mirovan de neyêne kirin di paşerojê de.

Ji ber van har du xalan, em dikarên bibêjin ku (DV) tenê dikare çavsoriyê di navbera millet bi xwe de rake, ji ber ew ê kar bike ji bo veqerandina mafên kesên ku bûne qurban, û di heman demê de jî, kar dike da carek din ew mafên han bindest nebin.

### - Çi têkilî di navbera dadmendiya veguhezane û civaka sîvîl de heye?

Em dîr naçin ger em bibêjin ku bê civaka sîvîl (DV) wê çê nebe, ne jî bêyî hukûmetek demokrat. Pêwîstiya civak a sîvîl ew e ku bibe dengê kesên ku bûne qurban, û karên civakî bike weke xebata ji bo aştîya sîvîl, giftûgoyan amade bike, û rê bide pêşîya



yasayek ku destê partiyan di (DV ) de ne xurt be.

**- Xalên girîng di pêkanîna dadmendiya veguhezane çi ne?**

(DV) wê ne ew be, ger ne giştî be, Ji mafên hemû kesên ku bûne qurban li wî welatî. Wê ne ew be, ger yasa ya (DV) bihêle ku kesin ji dadmendiya bazdin. Wê ne ew be, ger (DV) li ser çaksazkirina dezgehên dewletê kar neke. Bi rengê ku nehêle careke din binpêkirina mafên mirovan dubare bibe.

**- Rola civak a sîvil û rêxistinên di hişyarkirinê de ji bo pêkanîna raman a dadmendiya veguhezane çawa ye?**

Bi taybet ev rol ji civaka sîvil tê xwestin, hişyarkirina bo (DV) xurt bikin, di nav millet û serokên civakê de. Civaka sîvil dikare roleke baş di avakirina (DV) de bilîze, di rêya avakirin a hevnerînek dirust re li ser (DV) di nav millet de, û wê ev pêk nayê ger millet ne hişyar be ji wateya vê têgehê re.

**- Rewşa Sûriya yê di bin siya tawanên**

**ku dibin de, wê çawa derbasî qonaxa Dadmendî ya Veguhezane bibe?**

Di vê qonaxê de, rewşa Sûriya yê ne taybet e, gellek welatên din li cihanê di rewşek wisa re derbasbûne, gellek ji wan (DV) li cem xwe biser xistin, û li deverin din têkçû.

Lê eger taybetmendiyeke Sûriya yê hebe, wê ew be, ku milletê Sûriya yê bi rengê berfireh û bi kêfxweşî dikare (DV) bipejirîne. Milletên Sûriya yê, bitevahî, kultûra lêborînê li cem wî heye, ev kultûr di nav civakê de jiyana xwe dibîne û bi rengê rojane, çi di gotinên bav û kalan de, çi jî di rengê têkiliyên civakî de. Ev kultûr wê karibe rahêje barê herî mezin ji (DV).

**- Çawa wê danûstandin bi binpêkirina mafên mirovan re hebe?**

Sê xalên girîng hene ji danûstandinê re di vê mijarê de:

binpêkirin gerek bêne naskirin da sûc winda nebin.

binpêkirin gerek ne bêyî lêborîn be.

binpêkirin gerek bêyî ku mafên ew kesên bûne qurban venegerin, pûç be?

Bêguman, (DV) ava bûye li ser mercên ku ti carî erê nebe li ser windabûna sûcê wan binpêkirinan, an jî mafên ew kesên ku bûne qurban bêne xwarin.

**- Tu dikarî li ser hindêk nimûneyên ku pêk hatine di warê dadmendiya veguhezane de biaxivî?**

Gellek nimûne hene ji pêkanîna (DV) re li seranserê cihanê, yên herî berbiçav ên Arcentina, Başûrê Afrîka, û li dewletên Erebi mîna Marogoyê. Ev sê nimûne ne, her yek ji wan taybetmendiyeke wê heye, li Arcentinayê piştî deh salan ji guhertina rêjîmê, ji nû ve dest pê kirin ku ew kesên bersûc werin dadgehkirin, ji ber bû mercek ji guhertinê re, da serokên rêjîma leşkerî li wir bîn lêborînkirin.

Li Başûrê Afrîkayê cara yekemîn bû ku bi awayekî vekirî û fermî komîta lihevanî û rasteqîneyê bi serokatiya (Desmond Tutu) re dest bi lêborînê kir, ji wan kesên ku dibêjin em şaş bûn û agahiyan dibêjin ku dihêlin tawanbarên mezin bîn girtin.

Li Marogoyê (DV) çêbû bêyî guhertina rêjîmê -wekû ku milletê Sûriyayê dixwaze- gawek mezin di hêla demokratîkê de çêbû, lê pergala dewlet û kesên wê man weke berê.

Em dikarin vê bibêjin, li her deverê ji çîhanê taybetmendiyek (DV) heye, ev ji bîngêhên vê têgehê ye, ger her milletek têgehê xwe di vî warî de çêke.

### **- Wê çawa dadmendiya veguhezane çêbecê bibe?**

(DV) divaye ku di qonaxek amadekirinê re derbas bibe, amadekirin ji bo avakirina têgeh a (DV) di navbera millet de bi awayekî dirust bibe, û di navbera serokên civakê de jî, her wisa amadekirina dosyayên bînpêkirinan ji bo dadgehên herêmî yan jî navdewletî re.

paş re avakirina yasayek bo (DV) piştî ku desthilata zagonê demokrat çêbibe, ev yek jî gelek kar jê re gerek e, nemaze ji hêla rêxistinên mafên mirovan yên herêmî û navdewletî, û rêxistinên ku li ser (DV) kar dikin.

### **- Di civakên ku nakokî tê de berdeyam e û yên piştî bidawîkirina nakokiyan de, rola desthilat a zagon û dadmendiya veguhezane yê, çawa ye?**

Bêguman, ev karê (DV) ye, çî di civakên ku nakokî tê de heye, yan jî yên ku jî nû ve nakokî derbasî civakê bûye.

Di vê yekê de, rêxistinên civaka sîvîl ên ku li ser (DV) bi rengekî berfireh kar dikin, dixebitin ku yasa ya (DV), desthilata zagonê derxe, da mafên ew kesên ku bûne qurban tê de hebin, û çawa destên siyasî yên partiyan jî jê derxin. Rola desthilat a zagonê ew e ku yasayek durist ji bo (DV) derxe rojevê, û rola rêxistinên sîvîl ên (DV) ew e ku bi bandor bin ji bo pêkanîna vê yasayê, û xebatê bikin da vê yasayê bikar bînin di nav civakê de piştî ku derkeve û bi rengê ku ew bixwazin.

### **- We ti kar ji bo amadekirina zemînekê ji dadmendiya veguhezane re li herêma kurdî kiriye?**

Karê me li herêmên Kurdî hîn bi awayekî xurt dest pê nebûye, me karin kirine da bîngêhek ji (DV) re ava bikin di nav Encûmenên navxweyî de , lê hîn ev kar bidawî nebûye.

### **- Projeyên we ji bo paşeroja dadmendî ya veguhezane di herêmê de çî ye?**

Em ê li ser sê xalan kar bikin di herêma Kurdî de:

Em ê kar bikin ku (DV) li herêma Kurdî ne cuda be ji prosêsa ku li Sûriyayê çêdibe. Ger cudabûn çêbibe di navbera her du prosêsan de, wê herêma Kurdî ji xelesa encamên ku (DV) dixwaze bîngêhe wan derkeve, û paş re dê ji xelesa karên çaksazî û bijardina kesên ku bûn qurbana şofîniyeta rêjîma Sûriya yê jî derkeve.

Em ê kar bikin ku çareseriyek ji mijara kesên ku bêyî mafên niştecîbûnê ne bibînin.

Emê kar bikin ku çareseriyek ji mijara zinar a Erebî re bê danîn.

### **- Di nerîna te de, ta çî astê wê têgeha dadmendî ya veguhezane di civakê de were pejirandin?**

Wek di destpêkê de mi got, ez bawer nakim ku wê civaka Sûriya yê bi hemû pêkhatiyên xwe (DV) nepejirîne, ev rastiyek e ku (DV) ne biyan e ji civaka Sûriyayê ve, lê gerek e (DV) bêye nasîn bi rengê xwe yê rast, û di vê rûdanê de ez ê bixwazim ji wan kesên ku têgeha (DV) belav dikin, ku bi rengekî rast belav bikin, û bi milletê bidin nasîn ku wateya (DV) ne ew e ku kesên bersûc wê ji dadmendiya bazdin, ne jî wan bixapînin bi gotina em dikarin her kesî bînin dadgehê. (DV) gellek pêvajoyên wê hene ku van bînpêkirinan sererast bike.







**Lêpirsînek li ser rewşa beşê lêpirsînan di rojnameyên rojava de .**

## Rojnameyên Rojava û lêpirsîn li hev nayên

Zana Ümer

**P**îştî derfeta azadiyê ji çapkirinê re li rojava, pir kovar û rojname derkertin, hin ji wan bi tevgera siyasî ve girêdayî ne, yên din jî bi dezgehên serbixwe ve. Nemaze, li ser rûpela lêpirsînê di van kovar û rojnameyan de, ev lêpirsîn min pêk anî.

Gotina navdarê rojnamegeriya lêpirsane (Michel Bilton) yê Amerîkî ku dibêje " ti carî rastî bi destnakeve, ger ne bi naskirina pirsên lihevati be, ew pirsên ku diva be rojnamevan wan bipirse ". Jixwe lêpirsîn, weke bêje, ji pirsê hatiye, Rojnamegeriya Lêpirsane dibê beşê herî ekadimî û pişpor di nav beşên rojnamegeriyê de.

Pirsek min bi ber vê lêpirsînê ve bir, çima di rojnameyên ku li rojava de têne belavkirin lêpirsîn di nav beşên wê de bêpar in !!? Gelo ji ber ku wêrebûn ligel van rojnameyan tune ye da dosyayên gendeliyê vekin, û li ser hin kes an saziyan lêkolîn bikin û encamên xwe li ber raya giştî eşkere bikin, an deshilata ku heye rojnamevanan digrin, ger ev be, hîn me ne bihistiye ku rojnameyek ketiye bin pestanekê an hatiye girtin bi sedema dosyayek wisa.

### Rojnameya Ronahî û beşê lêpirsînê:

Ronahî rojnameyek Siyasî, Çandî, Giştî, Heftiyane ye. girêdayî dezgeha Ronahî ya ragihandin û weşandinê ye, 123 hejmar jê hatiye derketin. Rojnamevan Suheyra Elsûfî ya ku li ser lêpirsînan radiweste:

" Em hewl didin li ser mijarên ku bêhtir bala civakê bikîşîne rawestin, lê pirs ew e, gelo civak û saziyên xwe amede ne yan na ji bo rojnamegeriya lêpirsane, serjimar û belge di dest rojnamevan de tune ne, dezgeh û sazî jî di vê qonaxê de hîn bi behaneya ku di destpêkê de ne, wê çi belge ligel wan hebin ku nîşanî me bidin"

Rojname	Beşê kurdî	Hejmara rûpelan	Rûpela lêpirsînan	Hejmar	Beşê erebî	Lêpirsîn
Ronahî	4 rûpel	20	Ne berdewame	123	16 rûpel	1
Welat	17 rûpel	20	Tune ye	9	3 rûpel	0
Nûçeya dawî	2 rûpel	8	Tune ye	65	6 rûpel	0



Wisa berdewam dikir: " Ger rûdawek hebe bi tenê yê ku dîtibe em dikarin hevpeyvînekê bi wî re bikin, ji alîkî din ve jî, mîna dezgeh an berbirsiyar kes xwe nade pêş ".

Dema ku min li ser rewşa rojava û desthilata ku aniha heye pirsî, ger ew dibe kelem di rêya rojnameya wan de, ewê got: " ne her demê, û ne bi wateya ku bibe kelem, bêhtir ku buyerek hebe yan kêşeyek hebe, bi sedemên ewleyane lêpîrsîn tê rawestandî, an jî ger erê di destpêkê de tune be. Desthialta ku aniha heye ji perçewendiyên xwe dibîne ku şerekî wisa li dijî gendeliyê hebe, ew dibîne ku ev erkê ragihandin û çapemeniyê ye ".

Gelo dibe ku kesek bi desthiladar be, û bibe kelem di rêya lêpîrsînekê de, ku belkî encama wê ne li gorî wê be, ti lêpîrsîn hene ku hatin rawestandî di rewşek wisa de?

" Ronahî bû yek ji sedemên ku

berpîrsayek di şarederiyê mezin a bajarê Qamişloyê de ku here cem Asayîşê, di encamê de ew berpîrsyar ji karê xwe hat raştiştin ".

Ev 123 hejmar ji Ronahî derketine, berpîrsyarek ji karê xwe -ji ber lêpîrsînek rojnamevanî- hate dîrxistin . Li rojava ev buyerek balkêş e !!?

Di encama lêkolînên li ser naveroka rûpelên Ronahî yê de, mirov dibîne ku rûpelek ji bo lêpîrsînan nehatiye danîn, li gorî Elsûfî dibêje ku " di nava rûpelên Ronahî yê de beşên civak, abûrî, jin û siyasî hene, dibe carinan ku di her rûpelekê de ji van beşan lêpîrsînek li ser wê hebe, mîna ku lêpîrsînek li ser buyerek jinê hebe di beşê jinê de. Lê ta aniha me ti rûpel ji bo lêpîrsînan pêk neaniye, bi hêvî ne ku di paşerojê de em karbin vê gavê pêk bînin "

**Kovara Welat :**

Welat kovarek Çandî, Giştî, Serbixwe, Nîvmehane ye. 9 hejmar jê derketine.



Îmad Talatî di destiya kovara welat de ye, li ser mijara ku çima beşê Lêpîrsînan di kovara Welat de pêk neanîne, Talatî wisa dibêje:

" Di qonaxa ku em tê de derbas dibin, a ku girêdayî ye bi rewşa welêt bitevahî. Di baweriyê min de, nearamiya siyasî û ta ya ewlehî jî dibe sedem ku gelek şaşî derbas bibin bêyî lêpîrsîn. Tenê li ser asta xizmetguzariya civakî dibe ku rojnamegerî bi erkên xwe rabe ".

ew li ser bingha rojnamevanên çalakvan hatiye avakirin, ev cûre ji rojnamevanan li sûriyayê hat afirandin, ji ber rewşa şer ê giran û derfeta ku rojnamevanên pispor nikarin derbasî sûriyayê bibin, çalakvan bi xwe bûn rojnamevan, projeyên van rojnamevanên çalakvan jî kovarek mîna Welat derdixînin, ma gelo ji ber ku lêpîrsîn wekû beşê herî pispor di nav beşên rojnamegeriyê de,





ta ku rojnamevanên çalakvan nikare lèpirsînan pêk bîne?

Taltî wisa vê mijarê dinirxîne: " Di warê pisporyê de, pîraniya kesên ku di ragihandinê de li Sûriyayê bigiştî û li herêmên kurdî bitaybetî dixebitin, ne bîspor in di karên rojnamegeriyê de, lê karîbûn gelek xebatên balkêş bikin, lewra jî ew dikarin ku lèpirsînê bikin bi ezmûnên xwe yê ku wergirtine ji qadê "


Îmad wisa berdewam dikir: " Di Welat de, em hewil didin, ku pîrisgirêkên civakî pêşkêş bikin di rêya raporên xwe re, ev pîrisgirêk girêdayî rewşa rojane ye, ne ya millet e, û wek alaveke ragihandinê, erkê me ye ku em van derbixin û bidine pêş li ber kesên berpirisyar da çareyan ji wan re bibînin "

### Rojnameya Nûçeya dawî:

Çandî, Siyasî, Nûçeyî, Rojane û serbixwe ye, li bajarê Heskê derdikeve û xwe dighîne bajarên Amûd û Dirbêsiyê. Ev rojnameya yekemîn e ku rojane li rojava derdikeve.

Xalid Ûmer li ser rojnameyê dibêje " Em bêhtir li ser rewşa nûçeyan bi rengekî berfireh radiwestin, nêzî 60 hejmar derketine, di du mehan de bêyî rawestandî "

" Em gelek zehemtiyan dibînin ji bo beşê lèpirsînan, ev rastî ye, pirê sedeman jî ev e, em nikarin vî beşê ji rojnamegeriyê pêk bînin, sedema herî xurt ku ew rojnamevanên pîspor û ekadimî ligel me tune ne, ya din jî ku ev beş ji nivîsandina rojnamegeriyê pir



serêsiyê ji saziya xwe re tîne. Em aniha nikarin vî barî hilgirin, dibe ku aramî bêhtir were bajarê me û her sazî, partî, tevger û kes, di bin kontirola yasayê de bin, wê demê em ê karbin lèpirsînan pêk bînin "

Her wisa Ûmer li ser girîngiya vî beşê ji rojnamegeriyê got: " Lèpirsînên rojnamevanî li ser gendeliya sazî û rêxistinên pir girîng e, em bêjin ne bêjin, rojnamegeriya me li rojava di vî warî de di kêmaniyê de ye, ji ber wê jî rojnameyên me nabin gelêrî, lewra em dûrî êşa milletê xwe ne "

Xalid berdewam dike û dibêje: " Lê em di paşerojê de dê li ser hin lèpirsînan ên rêxistinên sîvil rawestin, em encamên van lèpirsînan û belegeyên wê jî belav bikin. wê demê em ê amade bin jî ku qurbanîyan jî deynin; bêyî qurbanî em ê ti carî pêş nekevin "

Beşên rojnamegeriyê bi xwe felsefe ye,

her beşek pêdivî û pêwîstiyek wê heye, li himber wê jî mercên geşbîniyê jî hene, hin merc bi rojnamevan ve girêdayî ne û hin bi civak û rewşa siyasî ve.

Ta aniha li rojava ji nav van rojnameyên ku me xistibû nişna lèpirsîn a xwe de, dora 200 hejmarî bigiştî derketine, tenê lèpirsînek di rojnameya Ronahî de pêk hatiye.

Rewşa siyasî, çespondina civakek yasayî, belavkirina têgehên civaka sîvil û geşbûna bazirganiyê dê têra geşkirina rojnamegeriyê bike. Ev li rojava hîn pêk nehatiye. Lê li himber wê jî rojnamevanên rojava sed carî radiwestin, berî ku berê xwe bidin vî beşê girîng ji rojnamegeriyê. Di encam de rojnameyên rojava ji rojnamegeriya lèpirsane bêpar in.

# Hêmin...şagirtê sirûdbêj

Ebas Mûsa

Hêmin zarokê 10 salî ye, ku li gundê Digirê yê girêdayî bajarokê Tirbespiyê li rojavayê kurdistanê dijî, û bi kêfxweşiyê mezin diçe dibistanê. Dema ez li waneyê wan amede bûm, fêrî zimanê kurdî dibûn, ku waneyên wan bi giştî bi zimanê Erebî ne, û bi tenê sê waneyên zimanê kurdî di heftiyê de hene.

Di rûyê wan de, ew hezkirina mezin ji zimên re xuya dikir. Bi serbestî dixwendin û dinvîsîn, û bi serbestî sirûd dixwendin. Di dawiya waneyê de sirûda "Ey reqîb" tê xwendin. Hêmin jî weke zarokan bi hêz sirûd dixwend, wekû ku dixwest dengê wî bighêje devereke dûr.

Desthilatdariya Bais di dirêjahiya 40 salî de, ji bilî sirûdên Bais ne dihişt ku di dibistanan de bêne xwendin. Di gundin wekî Digirê de jî ku tevahiya nişteciyên wê kurd in, ev pergal dihate birêvebirin. Hêmin di sala yek û duduyan de ji xwendina xwe gihîşte wan sirûdan, lê wateya wan nizanîbû.

Dema ku em derketin, Hêmin bersiva min da, ser sirûda (Ey reqîb) û got " ez dizanim ku ev sirûd girêdayî miletê kurd e».

Di çiriya pêşî de ji sala 2012 an, Saziya Zimanê Kurdî (SZK) biryarek da ku zimanê kurdî dê wê di dibistanan de û bi awayê fermî bêye fêrkirin, (SZK) mamoste şandin dibistanan, lê di encama vê biryarê de rêveberiya perwerdeyê ya giştî ya girêdayî rêcîmê, bi daxwaza Bais biryarek derbarê van dibistanan stend, da ev dibistan bêne girtin.

Piştî 45 rojan ji girtina dibistanan (SZK) gihîşte rêkeftinekê bi rêveberiya

perwerdeyê re ku zimanê kurdî were perwerdekirin di dibistanên ku di tax û gundên kurdî de ne.

Dema ku me dixwest (Ez û Hêmin) em beşdarî waneya kurdî bibin, du zarokan dixwestin ku derkevin, ez bi kurdî bi wan re axivîm, lê bi erebî li min vegeandin, min bi ken ji wan re got: (hûn fêrî zimanê kurdî dibin) bi erênî vegeandin, û bilez çûn, Hêmin bi dengê hêdî ji min re got ku ev zarok ji erebên Xemir in, ên ku li qiraxa gund dijîn, û pirê caran di dema waneya kurdî de ew diçin malê.

Hêmin ( li gorî temenê xwe yî piçûk) nizane ku fêrbûna zimanê kurdî çendî zor bû, û çend kes ji bo vî zimanî ketin zindanan, û çendî zor bû xwendina sirûda ( Ey reqîb ) ya ku aniha di dawiya waneya kurdî de dixwînin û bi dengê bilind jî.

Dema wane bi dawî bû û şagirtan dest bi ( Ey reqîb ) kirin, girinijînek ji rûyê mamoste dawerivî.

Dema ku min ji Hêmin pirsî, ka çî cudayî heye di navbera pola yek, du, sê û çaran de, Hinekî rawestiya û destê xwe ber bi polê de kir: " li vir wêneyê Beşar El-esed hebû, lê aniha tune ye, û aniha em hînî zimanê kurdî dibin.

M.M.Seîd Mamostê zimanê kurdî ye, û ew e yê ku waneyên din jî dide, ew jî ji gund e, M.Seîd ji beriya 25 salan xwe fêrî zimanê kurdî kiribû, wê dema ku Bais bi hemû awayan dijîtiya kurdan dikir, bi taybet dijîtiya zimanê kurdî.

Tevî ku fêrkirin hîn ji rêbazên wezaretê perwerde ya giştî ya Sûriyê ne, lê hêvîya yekîtiya mamosteyan li Qamişlo heye ku di paşerojê de karibin zimanê kurdî firehtir bikin, û bibe zimanekî fermî, her wiha karibin rêbazeke yekbûyî bi zimanê kurdî amede bikin.

M.Seîd dibêje: " ku yek ji encamên herî girîng di vê şoreşê de ew e ku derfet ji fêrkirin a zimanê kurdî çêbû ye ", ji ber dibîne ku zimanê kurdî hebûna kurda ye.

Li seranserî Rojavayê Kurdistanê navend, û dezgehên zimanê kurdî hatine damezrandin, da ku tê de zimanê kurdî fêr bikin. Lê ew salên qedexekirin û dorpeçkirina zimanê kurdî yê dirêj, dihêlin ku çî gav were avêtin piçûk xuya bike.

Hêmin û nifşek mezin dê fêrî zimanê kurdî bibin û sirûdan bixwînin bêyî ku bitirsin ji binçavkirinê.



## Qamişlo bajarê hevjiyaneke ciyewaz

Zuhrab Qado

Her du ferên aş erwanên gundiyan hûr dikirin , lê dengê balkêş ne xumexuma avê bû, lê belê yê çeçeçeqa perwanan bû, û di wê demê de xelkê ji wî aşî re digotin "aşê Çeçeçe", û paş re navê wî çemê ku ew aş digerland bû çemê Çeçeçe.

Gundiyan derdora aşê Çeçeçe – bi taybetî ji deşta Xelef Axa, deşta Mêrdînê – bi saryana sibehê re erwanên xwe tanîn vî aşî. Ji hev re digotin «em dê herin aşê Çeçeçe erwanê xwe bihêrin û hem jî ji xwe re qamiş ji qiraxên çem bibirin û bînin malê». Vêca bi vê sedemê navê wî aşî bû aşê " qamiş lê", û çaxa ku xanî û qûnax li derdora êş ava bûn, navê wî gundî – dûv re yê wî bajarî – kirin Qamişlê. Paş re ev nav bi gellek rengan hat bilêvkirin, weke: Qamişlê, Qamişliyê, Qamişlo, Qamişlokê û Qamişlî, lê Kurdan navê Qamişlo pejirandin.

Bi vî awayî Ebas Isma'îl kurteçîroka avabûn a bajarê Qamişloyê tîne ziman di pirtûkek xwe de.(1)

Li ber dîmena girên ku şaristaniya Mezopotamyayê di xwe de nixumandiye, li vê deşta fireh û bê ewle – berya Mêrdînê – berjewendiyên dewletên mezin û jinûgeşbûna vê axê bi hev re digihên.

Bêguman bi hevrikiya di navbera dewletên Ewropayî li ser paşmayiya dewlet a Osmanî û piştî cenga cîhanê ya yekemîn derbarê hevpeymanan (Sykes-Picot) 1916 an de, herêma Cizîrê ya navîn bû para Fransayê, jixwe herêma Cizîrê ji sê beşan pêk tê " Cizîra jorîn bû para Turkyayê û ya navîn li Sûryayê û ya jêrîn jî bi ser Iraqê de hate berdan".

Di sala 1922 an de artêşa Firansa gihiştê herêma Cizîrê, û di sala 1923 yan de li gundê Beyandûrê ya Yûsivê Heso ji êla Hecî Silêmanan qezakî girêdayî Dêrazorê bi navê qezaya Beyandûrê çêkirin. Û mirovekî bi navê Salim Nûh kirne Qayimeqamê wê, û efserê Fransî yê bi navê Rogan fermandarê wê

yî leşkerî bû. Di wê navberê de êlên herêmê û bi mebesta alîkariyê û nerqayilbûnaja vî desthilatdariyê re, gaziya xwe avêtin Haco axayê Hevêrkan û wî zilamin xwe şandin û Salim Nûhê qayimeqam kuştin, di encamê de Roganê efser gellek îşkence li şênîyên herêmê kir bo naskirina kujerên qayimeqam, lêbelê îşkenceya wî gihiştê ku (Ebasê mihemedê Ebas ) kurê birayê Silêmanê Ebas, axayê êla Dorikan were kuştin, îca Silêmanê Ebas careke din gazî û hewara xwe avête Haco Axayê Hevêrkan û êlên derdorê.

Û ev yek bû sedema ku di 28ê tîrmeha 1923yan de, baregeha qezaya Beyandûrê were rizgarakirin û pevçûneke giran li Girê Ebas di 31ê tîrmeha 1923 yan di navbera her du aliyan de biqewime, û di encamê de leşkerên Fransayê li wê herêmê biqelin. Pişt re Fransiyani di sala 1925 an de qezakî li gundê Qîro çêkirin, lê wan dît ku ew cih ji wan re li kare, lewra wan herêma başûrê bajarê Nisêbînê û ji ber gelek sedeman hîlbijartin bo ku bibe navenda qezaya wan.

Di 20ê tebaxa 1926an de, şandeya Fransî qîşleya xwe liser girê ku li başûrê bajarê Nisêbînê û baregehek bo rêvebiriyê li binya wê ava kirin. Wê çaxê ji bilî qûnax û aşê Qidûr Beg ti avahî li wê derê nebûn, û ew zemîn piraniya wê milkên malbata Nîzamedîn bûn(2). Hêjaye gotinê ku efserê Fransî yê bi navê " Terror" ew bû yê ku herêma başûrê bajarê Nisêbînê hîlbijrat bo ku bibe bajarê Qamişlo û ji endazyarê yûnanî yê bi navê " Xeralepos" (3)xwestibû ku nexşeya bajêr xêz bike. Destpêkê qîşleya leşkeran û baregeha rêvebiriyê û pişt re pireke li ser çemê Çeçeçe hatin avakirin, û Fransiyani Xirstiyan û pişt



re Cihû û zemîndarên bajarê Nisêbînê vexwendin bo avakirina bajarê Qamişlo. Lê hin dibêjin ku mirovek hebû bi navê Seyid Hesên ew bû yê ku destpêkê li vê derê niştêcih bû û konê xwe lê vegirt, û pişt re xanî ava kir û xelkê ji xwe re li dora wî ava kirin. Bêguman ev dide xuyakirin ku bajarê Qamişlo bi destê hemû gelên herêmê ava bû, Cihû, Xiristiyan, Misilman, Kurd, Ermen, Sirya, Ereb û her yek ji wan xwest ku vî bajarî xweşik û bedew bike. Bi rastî jî kêma bajar mîna Qamişlo hene, ku bi lezûbez û di demeke kurt de ava û geş dibe. Ji ber avabûna bajarê Qamişlo dide xuyakirin bê çendîn derfet li pêşya hêviyan hatin vekirin, ev lihevgihandina rengareng dê wê rûpelin nû di dîroka gelên herêmê de veke û her yek tiştê di dilê xwe de derîne û bike nişana hebûna xwe.

Nivîskar Konê Reş di pirtûka xwe ya bi navê Dîroka bajarê Qamişlo(4) de gellek dever û avahî û taxan tîne ziman û wiha dibêje:

Taxên pêşîn ku li bajarê qamişlo avbûne ev in:

- Taxa Cihwan: Ev taxa ji hêla Cihwên ku ji bajarê Nisêbînê hatibûn hate avakirin û ew li qiraxa çemê Çeqçeqê û dikeve başûrî Erasê.

- Taxa Qidûr Beg: Li rojhilatî çemê

Çeqçeqê ye, ji qesra Qidûr Beg dest pê kir û xelkê dîv re li derdora wî ava kirin.

- Taxa Bişêriyê: Li rojhilatî çemê Çeqçeqê û başûrî taxa Qidûr Beg e, yekemîn mal Şikriyê Emînê Perîxanê di sala 1933 yan de piştî kuştina bavê wî, Emînê Perîxanê li Bişêriyê ava kiribû û pişt re Kurd û Xiristiyanên ji herêma Bişêriyê xwe lê girtin û ava kirin.

-Taxa Siryanan ( Wista): Ev taxa li ser zemîna başûrê Qişleya Frensî hate avakirin, piştî ku şandeyê dest danî ser û ew li Xiristiyanên ku ji herêmên Tor Abdîn û Mêrdînê hatibûn, bi erzanî belav kirin.

- Taxa Aşûriyan: Li rojhilatî taxa Bişêriyê ye û ew ji hêla Aşûriyên ku ji Iraqê reviyabûn di sala 1933 yan de hate avakirin.

- Taxa Ermenan: Li başûrê taxa Cihwan e û ew ji hêla Ermenên ku ji ber Komkujiyê reviyabûn hate avakirin.

- Taxa Elî Fero ( Xerbî): Zemîna vê taxê ya Hesênê Çelebî, Isma'îlê Elo û Hisênê Edê bûn, û niştêcihên wê ji Kurd û Xiristiyanên ku ji Amûdê û gundên rojavayê bajarê Qamişlo ne. Lê îro bajarê Qamişlo bêhtirê van taxan, gundên derdorê " Hilêliyê, Hilko, Enteriyê, Cirkikê, Cim'ayê" lê gihane û bûye bajarekî mezin û bedew.





Bêguman wekû em dibînin bajarê Qamişlo ji ol û netewan rengareng e, û her yek ji wan dixwest ku li yê dinê bêhtir bike û navê xwe lê hilde, avakirina bajarê Qamişlo mîna pêşbirkekê bû di navbera van rengan de, her yek perestgehên xwe yên olî, seyrangeh, xan û ûtêl, çayxane, aş, bazar, pîşe .... hwd, ava dikirin, ta ku bajarê Qamişlo ji devereke av û çirav, beriyeke ji qamişan gihişte vî şeweyê ku em îro dibînin. Ta îro jî kalepîr hene dibêjin: Bavo, ev çi li dinyayê çêbû! Doh bû şûna vî bajarî guhera pezê me bû, çêregeha dewarên me bû(5).

Bi rastî jî, nexşeya bajarê Qamişlo nexşeyeke bedew

û xweşik e, û ji ber nêzîkahiya wê bi nexşeya bajarê Parîsê, jê re " Parîsa biçûk" hate gotin, û ji ber geşbûna wê ya aborî û çandiniyê, şandeya Emerîkî ya çandiniyê di salên pêncî ya sedsala bûrî de wê bi " California ya Rojhilat" dane naskirin, û ji ber xêrûbêrên wê ew Bûka Cizîrê ye, Bajarê Evînê ye wekû hunermend Se'îd yûsiv wê di sitraneke xwe de bi nav dike. Qamişlo dimîne bajarê hunermend, nivîskar, pîşesaz û rengîniyê. Bajarê Kurd, Siryan, Ermen, Aşûrî û Erban, Xiristiyân û Misilmanan, Qamişlo, Qamişliyê, Zalîn û Bajarê Evînê. Derfeta hêviyan bû, da ew hêvî pêk werin.

### Jêder û lêveger

- (1).Nameyek ji Gorê, Abbas Isma'îl, çapa yekemîn 2012, rûpel (43).
- (2).Endazyarekî Yûnanî bû, di salên ji 1929 an tanî 1932yan de di kompaniya hêla hesinî ya Elmanî de dixebitî.
- (3) .Tarîx Elqamişlî, Konê Reş, dîrîse fî nişû'îha we tetewireha elictîma'î welumranî, çapa yekemîn 2012, weşanên "Dar Ezzeman", rûpel (131-132). Bo agahiyên berfireh derbarê avabûna bajarê Qamişlo, hun dikarin vê pirtûkê bi zimanê Erebi bixwînin.
- (4).Ew bi xwe weqfên gora Zeyin Elabidîn ya li Nisêbinê bûn, û Nizameddîn xizmetkarê meqama wê gorê bû, û ew zemîna tev bi wî û zariwên wî man .
- (5) .Nameyek ji Gorê , Abbas Isma'îl , rûpel ( 48).





## Mirovanî bingeh û handera welatperweriyê ye

Cad Elkerîm Elcibayî

Wergêr: Ebdelah Şêxo

Welatperwerî, wekî ku me berê me anî ziman, peyrewî û endamtîyeke têgihîştî û qutebir e, bo dûgela niştimanî ya nûjen, li ser binetara mafên şarwer û ramyarî yên wekhev û erk û pêgirîyên van mafan; ji ber ku welatperwerî peyrewî û endamtîyeke gihiştî û qutebir e, ramyarî û sincî ye, bo komeke ramyarî ya nûjen ku ew miletê nûjen e yê ku pêşveçûna dîrokî tevina wî rêsaye, ne xewnên utopîyayî û dilxwazîyên xweberî û ne jî eletewşîya aydîyolojîyane, neteweyî, îslamî yan proleterayî. Û me destnîşan kir ku layîkî kakilê miletê nûejn û kakilê dûgela niştimanî/neteweyî ya nûjen e. Û me xwe spart danasîna Carl Marx ya dûgelê ku ew "jîyana cihêwaz a kesan e" li hemberî jîyana wan a taybet û takekesane, û me destnîşan kir ku dijîtîya dîyalektîk di navbera jîyana kesan a taybet di civaka şarwer de û jîyana wan a cihêwaz a giştî di dûgela ramyarî de, ew dîmena rastîn a rasterast e ji dijîtîya dîyalektîk di navbera civaka şarwer û dûgela ramayarî yan dûgela niştimanî de. Û pişt re em gihiştin encamekê ku danîna layîkîyê li derveyî çarçoveya vê dijîtîyê, dê wê bike aydîyolojîyeke layîkane li beranberî aydîyolojîyên olî, zavî û hizirî yên din.

Dijîtîya dîyalektîk di navbera jîyana kesan a taybet û takekesane û jîyana wan a cihêwaz a giştî de, ew bi xwe ye dijîtîya di navbera kesê xwezayî yê ajotî bi destê pêdivî, berjewendî, dilxwazî, kam û nîyazên xwe de... Û hemwelatîyê ku xwe bi nîrxên qencî, maf û bedewîyê ve girêdide. Û jixwe

ne hêjayî gotinê ye ku mirov bi nasnameya xwe ya giştî, gelemper û xas gewherê kesê xwezayî ye, û gewherê kesê hemwelatî ye û li gor vê yekê, kesê xwezayî (filan an bêvan) ew mirovê di civaka şarwer de ye; û hemwelatî ew mirov bi xwe ye, di civaka ramyarî de yan di dûgela niştimanî de.

Hemwelatî têgihêke xas e ku vedigere zindîwerek ramyarî û sincî. Û dûgel têgihêke xas e, ku ew jî vedigere ser zindîwerekî sîyasî û sincî. Lê tiştêkî xastir ji kesê hemwelatî heye û her wisa tiştêkî ji dûgela niştimanî heye, ji ber ku wateya kesê hemwelatî naçe serî ku neyê girêdan bi dûgela ku ew peyrew û endamê wê ye, û têgeha dûgela niştimanî naçe serî ku neyê destnîşankirin. Ev tiştê zor xas têgihê yê mirov e, yê ku vedigere zindîwerekî hişmend û sincîn û vedigere koma mirovî ya hişmend û sincîn.

Mirov kakil û gewherê kesê xwezayî ye, û kakil û gewherê yê hemwelatî ye. Û hêza hemwelatîyê têkilîyeke/ têkilîyên xwedî naverokeke civakî,



aborî, çandî, ramyarî û sincî ye di navbera hemwelatîyên dûgela destnîşankirî ji hêlekê ve, û di navbera yê hemwelatî û dûgela ramyarî de ji hêleke din ve, nexwe bingeha qayîm ya vê têkilîyê ya/van têkilîyên berdêlî her mirov e. Têgeha mirovê xas dîyar nabe di

rastîyê de meger di kesan de, mê bin yan nêr bin. Kesên cihêreng di her tiştî de, yeksan û wekhev in di mirovanîyê de, çunku mirovanîya tu kesî ji ya kesê din ne bêhtir e. Û hemwelatîtî û welatperwerî dirust nabin ku neyên avakirin li ser vê bingeha mirovane. Çunku ew nabe

hemwelatîtî ku ew ligel cihêkirineke nijadî, olî, zavî, etnîkî yan civakî be.

Ev e tiştê ku koma ramyarî, ango miletê nûjen, cihêwaz û nêvnas dike ji hemû komên din, ên etnîkî, olî û zavî... Û ji bilî wê, ji komên asê yên girtî, yên ku hîn astengeke cetin in di rêya pêkanîna miletinên nûjen di welatên pašvemaî de jî.



Û li gor vê yekê, mirovanî bingeha welatperwerîyê ye, û ew e ya ku dil û mejîyê wê vedike li ser asoyin ên cîhanî û mirovanîyane yên berfireh, û nahêle ku ew destê vederbûn û radîkalîyê bigire. Û jixwe me li cihekî din dît ku welatperwerîya radîkal cureyekî emperyalîzmê ye, ku ew tê de yan êrîşê dibe ser hinan yan hin êrîşê dibin ser wê; emperyalîzmeke bi karkirinê yan bi hêzê, emperyalîzmeke bi erênîyê yan emperyalîzmeke bi neyînîyê û welatperwerîya radîkal cureyek e ji cureyên faşîzmê jî.



Civakên klasîk ên pašvemaî, nola civaka me, nikarin derkevin ji nav tanên lasayîkirin û çavlêkirinê, perîşanîya pašvemaîyê û tarîtiya serdemên navîn yên ku hîn hazir in di têgihîştin û karên wan de û ew nikarin ji cîhana zordestîyê derkevin meger ku ew welatperwerîya xwe li ser bingehin mirovanîyane û gerdûnî ava bikin. Mirov kesê xwezayî ye û ew e yê hemwelatî. Û ji ber vê yekê, mafên hemwelatîyan hatin girêdan bi mafên mirovan,



fena girêdana beşê bi tevahîyê. Azadîya kesan bingeha azadîyê ye û mafên hemwelatîyan bingeha mafan e. Civaka şarwer a nûjen meydana azadîyê ye û dûgela niştimanî ya nûjen meydana zagonê ye. Têkilîya dîyalektîk di navbera azadî û zagonê de ew bi xwe ye têkilîya dîyalektîk di navbera azadîya xweyî û azadîya heyberî û di navbera sincên xweyî û sincên heyberî de ye. Civak û gelên pêşketî zagonê wekî azadîyeke heyberî û sincin heyberî dibînin. Em zor pêdivdarên danîna têgiha azadîyê, têgiha sincan û têgiha zagonê ne di çandên xwe de, di têgihîştina xwe ya civakî de, di nêrînên xwe yên ramyarî de û di bernameyên partiyên xwe de. Û dixuye ku ev yek ne gengaz e berî danîna têgiha ye mirov û mafên mirovan.

Divê em şaş nebin li beranberî ramana ku em gelek "koletî û perestinan" ji xwe re dibijêrin û em aşop dikin ku bijartina me ji koletî û perestîne re bi tena serê xwe azadî ye. Hinan ji me peristina kesekî bijart; kesekî nola xwe û heye ku ew kes jê kêmtir be di warê hizirî, çandî û sincî de. Û piranîya me, yan jî me hemûyan, perestina aydîyolojîyê yan zavekê bijart û me xwe tune kir di ber wê aydîyolojîyê yan wê zavê de, û hîn neketiye bala me ku em mirovanîya xwe, anga azadîya xwe, bibijêrin.

Çawa kesek ji me dikare xwe wekî




kesekî dirust, hemwelatî û mirov bibîne heger ew xwe di yê din de danemezirîne? Û çawa kesek ji me dikare xwe damezirîne di yê din de, yê cihêreng bi etnîka xwe, ola xwe, zavê xwe, tîreya xwe, çîna xwe, hizira xwe, aydîyolojîya xwe, ramyarîya xwe, û ji bilî van heger ew kes tenegehîje ku evê "din" "ez" im û ew "anga yê din" dîyarbûna gewherê xwe yê niştimanî û mirovane ye? Demokrasî, di hêla xwe ya herî girîng de azadîya yê din e berî her tiştî, û ew misogerkirina mafên kêmara ramyarî (ya berhingar û dijber) e û misogerkirina azadîya wê ye berî ku desthilatîya zorîne û piranîya ramyarî be.

Welatperwerîyeke Sûriyeyî nikare bê avakirin heger ne li ser bingehin niştimanî/mirovî be, û demokrasî li Sûriyeyê pêk nayê heger neyê avakirin li ser heman bingehan? Demokrasîya em hêviya wê dikin

demokrasîyeke niştimanî/mirovî ye. Di bin ronahîya vê daxwazê de, dirdarîya (cynicism) kesê ku mirovekî gumanbar dike bi gawirî yan xinizîyê dîyar û eşkere dibe; dirdarîya wî bi hemû xwîngiranî, rûqayîmî, êrîşkarî û zordestîya xwe eşkere û belî dibe. Ez "yê din" im û yê din "ez" im, de ka em destên xwe deynin ser wijdanên xwe di derbarê xwe û welatê xwe de.

Mirovanî ne tenê bingeha qayîm a welatperwerîyê ye, belam ew bingeha azadîyê ye, heger ew ne azadî bi xwe be.



## Sêmalka dergehê penaberî û zimanê kurdî

Ciwan Nebî

Sêmalka dergehê penaberîya Kurdên Rojavayê ber bi başûrê Kurdistanê de, bi qasî ku Kurdên Rojavayê dûrî hev dixê, dûrî mal û mirovên wan, hew qasî wan nêzikî zimanê wan dike. Kurdên Rojavayê yê Kurmanc, ku li Hewlêr û Silêmaniyê bi soranî diaxivin, fêr dibin û Soraniyan fêr dikin kurmanciyê. Ev e mijar, gellekî girîng e...

Kesên serwestî ziman û zaravên zimanê kurdî diwarên di nav zaravên soranî û kurmancî de nas dikin, herwiha diroka Kurdan, rewşa siyasî û bobelatên bi ser wan de bariyayî ku bêhtir diwar bûn di nav van zaravan de, nedihîştin bigihêjin rehên xwe yê hevbeş weke zarokên zimanekî, nedihîştin mirovên zaravan bigihêjin hev. Dezgehên ragihandina kurdî, alavên têkliyê yê din jî, bi encama gellek sedeman biser nektin ku bi rola xwe, weke ragihandina erebî rabibin. Mînakê herî nêzikî ku roleke mezin ber bi nêzîkbûn û naskirina zaravên zimanê erebî de list. Li vir çareyeke din gerek bû, rêyeke din, Sêmalka, bi tevî hemî êşên xwe dergehêk bû ku van zaravên kurdî, ta asteyêkê pêrgî hev bîne, di jiyana rojane de, di kêlikên herî hestiyar de, em di rêya Sêmalka re diçin Hewlêrê, li wir pêrgî soranî tên, hewil didin di axaftina şifêrê soranî de bigihêjin, di axaftina goştîroş,

asayîş û pişîşkên soraniyan de, herwiha yê Soranî jî heman hewildanê dike, ber bi zimanekî hevbeş de, ber rehên ziman de, em yê ku ji derveyî TV an ger me Soraniyek li Qamişlo bidîta me wêneyeke xwe bi hev re dikişand, em nuha bi hev re dijîn û diaxivin, em hewil didin di axaftina hev de bigihêjin, fêr bibin, em biser dikevin...

Ziman, li hemî wellatan zaravên wan bi rengêkî yan bi rengêkî din dûrî hev dikevin, pêdiviya wan bi têkeliya zindî dimîne bo nêzikî hev bibin, bo mija bi ser wan de bariyayî zelal bibe, bi ser hev ve bibin, Sêmalka bi rola xwe dergehê vê têkeliyê bû, yê Soranî dema bi yê Kurmanc re diaxive hemî gotinên xwe yê kurmancî bikar tîne, herwiha yê Kurmanc, li vir zimanê kurdî dubare xwe nas dike û diaferîne, zimanekî hevbeş di gotinên cuda de jidayik dibe, em guhertina ku zarav bi ser gotinên me de dibarînin nas dikin. Çi xweş e yaw. Li Hewlêrê Kurdên Rojavayê bi soraniyeke tije gotinên kurmancî diaxivin, dixwînin, dinivîsin û rêya xwaringehêkê pêş Kurmancê ku hîna fêr nebûyî soranî dikin...

Bi hesanî: Em Kurdên Qamişlo, ger neçûba Kobanî, Efrîn û Helebê wê me ji axaftina Kurdên wan bajaran fam nekira, ne



jî wan, ev encama siyaseta li dijî zimanê me û dûrbûna di nav me de bû, lewra em nuha, bi encama pêkvejiyana hevbeş bi hev re diaxivin, bêyî ti alozî di têgihîştinê de, em zarokên zimanekî ne, li Hewlêr û Silêmaniyê nuha heman ezmûne dubare dibe, nuha li wan bajaran sêsed hezar Kurdên Rojavayê hene, sêsed hezar fêr dibin soranî û kurmanciyê didin fêr kirin, di rêya têkelî û danûstandina rojane de, em ji mêj ve pêdiviyên vê têkeliyê bûn, zimanê me pêdiviyê vê têkeliyê bû. Ez vê dibêjim, Sêmalka dergehêk e di nav Kurdên rojava û başûrê Kurdistanê de, di heman demê de dergehê zimanê kurdî ye di nav Kurmancên Rojava û Soraniyên Başûr de. Spasiya Sêmalka bikim?



## Tundûtijya li ser jinê

Isam Yûnis

Jin weke têgeh navek ji zayindekê re, ji ber jin bi xwe nûnertiya tuxmê mê ji mirov re dike, ji ber vê yekê jî, jin bi roleke mezin di avakirina civakê de dilîze,

Tundûtijî ew yek ji wan bezandinên herî xuyayî ye, yê ku li ser jinê têye bikaranîn, û bûye weke diyardeyeke cihanî, ji ber girîngiya vê mijarê. Dr.Mîdya Mehmûd lîkolînek balkêş nîvisandî ye di bin navê tundûtijya li ser jinê ku têye bikaranîn, sedem, diyarde, şêwe, û encama wê (weke nimûne Jin a kurd), ev pirtûk di sala 2008 an de di rêya pirtûkxan a çarçira ya çanda kurdî, bi zimanê Erebi hatiye çapkirin, û ev pirtûk hatiye wergerandin li ser destê nivîskar: Fewaz Ebdî, lê hîn ne hatiye çapkirin.

Pirtûk ji pênc beşan e, di beşê yekemîn de nivîskar tundûtijî weke gotin di ziman de dide nasîn. Û di yê duyemîn de şêweyên tundûtijiyê dide xuyakirin, weke ku Dr. Mîdya dide xuyan ku gellek şêwe di civakê de hene jê: tundûtijiya eşkere, a veşartî, a li ser laş dibe, a derûnî, a ramanî , a siyasî, û ya abûrî. Di beşê sêyemîn de li ser tundûtijiya gotarê/ gotara tundûtijiyê di xive, û weke mînakên tîne ziman çaxa dê ji keça xwe re dibêje:(ezê bêvila te jêkim),(stû yê te bişke),(bimire). Di beşê çaremîn

de sedemên vê diyardeyê şîrove dike û ji wan sedeman: Sedema ol, abûrî û civak, sedemên siyasî, sedemên perwerdeyî, sedemên ramanî, û sedemên derûnî. Di beşê dawî de ji vê pirtûkê Dr. Mîdya destnîşana encamên tundûtijiya li ser jinê dike, û ji wan encaman: diyardeya xwekujî yê, û ya din jî jin bazerganiyê bi laş xwe dike, lê weke ku tê xuyakirin ku ev tişt di civaka kurdî de tune bû wek civakên din.

Dr. Mîdya Mehmûd li ser xalin gellekî girîng di civaka kurdî de rawestiya ye, û dide xuyakirin bê çawa jin li cihekî bilind e, û ji mêj ve ew û mêr di yek pileyê de ne( Şêr şêr e çi jin çi mêr e), li ser rewşa wan jinên ku bi roleke xuyayî di jiyana civakên xwe de lîstin û bûne weke simbolan axivî, û helebet di civaka kurdî de jî gellek nav hene, yên ku serokatiya êlên xwe kirin, di karê siyasî û çandî de xebitîn, û ta gellekan ji wan rahiştin tîfingan û şer kirin, lê piştî ku civaka kurdî bû qadek ji civat û olin biyanî re û bi taybetî ola Islamê û civaka Erebi, civaka kurdî dûrî xwe û xuzayî ya bîr û baweriyên xwe çû, ji ber vê yekê gellek derd û êş di nav civaka me de peyda bûn, û yek ji êşên herî dijwar tawanên rûmetê ne, û mixabin bi awayekî berfireh ev diyarde belav bû, û ta ji hêla dewletê jî, ev pirsgirêk di yasayê de ne hate çareserkirin.



Di dawiya pirtûkê de Dr.Mîdya weke pirs dibêje: Em ê çawa li hemberî vê tundûtijiyê rawestin, û ev bi xwe barê rewşenbîr, hunermend, nivîskar, dezgeh, navend, û saziyên dewletê ne da karîbin yasayin sivil di vî warê de derxin, ku karîbin di rêya wan re parestina mafên jinan bikin.

## Bersiv

Ciwan Şerîf

Hişê min weke rîstek morîk  
 li ber koraniya pirsan diqetîne...  
 ma divê ez çavê xwe ko bikim,  
 qena bînahî bawer bike  
 ku ez di bedewiya çavê şeytên de xirboqirî  
 me ??  
 pa bera nîgatîv bihinkekê bi camêrya qulingan  
 û di koka leza wan de  
 ji dêvla behtandina çavê min re mikur werin,  
 pa bera hebûn û tunebûn di yek kêlîkê de  
 li qiraxa vê pirsê ku ez ji mêj ve  
 wê bi devê kerîyek pezkovîyê bi gîr kayin  
 dikim,  
 pêrgî hev werin,  
 pa bera hew carekê karibim tama jiyane  
 weke şekîrekî zêft bikim,  
 wek wî şekîrê gerim,  
 ê min ji destê wê mamosteyê digirt  
 tevî ku çavê zaroktiya min  
 bi bersivên zerhimî qamçî dikir !  
 Pa bera ez jî li dawîya vê xerçîrîne  
 di ardîlana xwe de  
 mendehoş bim ?!..

## Vekirina ben şûna wê ezger nake

Hesen Helîmê

Nebêje ev rivîna belakirî, gihayê gavên te ne,  
 nebêje xweşiya çirsandin a wan, te radiwestînin,  
 nebêje dawîya cîhanê, weke ku tu Televîzyonê vemirîni...!!  
 Belê tu bûyî yê ku dixwazî xelk lê binêrin  
 ji bo rojên te nebin çivîkên penaber di gulîstana  
 te yî ji axê,  
 belê tu bîra rivîne dipelîni.  
 Tiliyên te dibin zîvek hêrayî, bi ser diyariya sîwaran de  
 vedinişe,  
 û hinekî wan gong dike,  
 tu dikî kazkaz ji bo xelk li te bizîvirin, û benê ku zarokan  
 ji zû ve li qirîka te girêdane vekin,  
 yan li benda avêtina parîk nan li ser merdbûna sergoyekî.  
 Tu direyî û teriya xwe dihejîni,  
 Reyandina te qelsbûnek tund e, eşkere xuya ye ji keriyê  
 te ve,  
 dev qelsbûna te dikin, her wiha tu dikî kazkaz,  
 zûrzûra te dernakeve pêşîya kevirên ku tene te,  
 kevir îskîska tundiya bê baweriye, tu direvî ser mezê  
 li şûna tirba dê û bavê xwe dinêrî,  
 şûn jî te nabîne, şûn li tirsê xwe digere,  
 tirsê ku tu bi xwe lê digerî yan tu li benda piyara  
 gulleyekê yî,  
 ew ya li xwe deyne ku te bikujî.

## Sînema di şoreşa kolanê de

Şêro Hindê

Di şoreşên rast de, sînema ji hemû bûyer, çîrok, êş, wêrankirin û jinûavakirinê li kû dimîne? Bi tenê dîmenên nûçeyan li ser kenalên televîzyonan û wêneyên propaganda ya hêzên siyasî, hişê dîmenên şoreşê gêj dike, û ji wateya wê ya dirust û simbolîk derdixe.

Di şoreşên ku li Rojhilata Navîn digerin, filmên ku çêdibin di bin çî navî de bin, Belge Film yan jî Sînemaya Belgeyan yan cûreyên din jî, piraniya wan mîna hemû beşên wek siyasî, ragihandin û hêzên leşkerî li gorî berjewendî û nîrên aliyên ku piştgirî û alîkariyan ji wan re pêşkêş dikin girêdayî ne, ji ber ku çêkirina filmên sînemayê gellek mercan dixwaze, çî ji alî teknîk û pisporî yê ve be, û çî ji alî mercên hunerî û derfetên azadiya tevgerê ve be.

Di gellek karên ku di bin navê sînemayê de çêdibin, ew nerînên kûr çî ji bo dîmenê û çî ji bo diyacîtika ku di pêvdîçûna çîrokê de be peyda nebûye, ji bo ku ez gellekî li ser navên sînemayê, mercên û derfetên çêkirina wê ne axivim, tenê çend nerînên xwe li ser rasteqîneya wêne û dîmenên ku di vê şoreşê de hatine kişandin, û her wisa windabûna wateya hesteyî di hundirê dîmenên ku ji armancên xwe tî dîmenên ez dê bînim ziman,

ji ber mejiyê ku dîmenê hildibjêre bitenê mebestên ragihandinê pêk tîne, mînak, hejmara şehîdan ji hejmara tabûtan dide nasîn, bêyî ku rûyê ew kesê radîhêje wan tabûtan, çavên wan û lingên wan î lezok jî bike armanc û bide pêş qena wateya kûr ji bûyerê re kurt û hestiyar bike.

Di xwepêşandanekê de guhdana yekem ew e, ku girseyî ya gel bide xuyan an berovajî bike, lê dema, ew dayikên ku tî xwepêşandanê, û berê xwe didin malê, bitenê di kolanên de ramanê wan, dilên wan î şkestî, lîstikên zarokan di hundirê qerebalixê siloganan de, çalakvan û hunermendên ku li ser sînoran tîne girtin, berê sibehê di nav mijê de ku li aliyekî sînor welatê wan û li aliyê din di nav pençên leşkerên sînor de, ji bin pûtê serokê rêjîmekê ber bi pûtêkî din de, leşkerên sînoran, qerfên wan, rûyên wan î bê xweşbext, mixtiyên şebeşan ên ku bê çînî mane.

Li gorî ew tiştên ku mi anî ziman, wateya dîmenan û bedewiya wê û birêveçûna çîrokê li her alî xwe bi hev digrin, bêyî ku ti nameyên siyasî pêrgî rastiya van dîmenan bê, ne bi dîmeneke ku jinek rûyê xwe girtiye û li ser destdirêjiya ku lê bûye diaxive; hovîtiya mirovan tî xuyan, dîmenên leşkerên ku di odayên bûk û zavan de, bê çawa livîn



Didar Felemez

û kincên wan bela dikin û li xwe jî dikin, û wêneyên zemawendên wan pêş hev dikin û ji hev re li gorî hestên xwe yê qirêj şirove dikin.

Di piraniya karên ku di van şoreşan de hatin pêkanîn, her car tişteke kêm dima, yan bedewiya wêneyan, helwesta hunermend an jî mercên sereke yê hevgirtina çîrokê û simbolîtîka dîmenên rû bi rû, hestên afirandinê yê bê helwest û qirêja ragihandina bialî, tim derfetên



## Koçberî û dorayiyên wê yên navneteweyî

Ehmed Ilyas

**K**oçberî çalakiyek mirovanti xuzayî ye, ew bi sedemin girêdayî hundir û derve bandor dibe, û ew li gorî (Dîmografiya) tê nasîn ku ew veguhezandin e bi awayekî yekta yan komkirî ber bi devereke din de ji bo rewşek çivakî, abûrî, siyasî û yan olî çêtir.

Û ji hêla berdwametiye ve, dibe ku koçberî demkî be ji bo demek an armaceke destnîşankirî, ku paş re yê koçber vegere welatê xwe, mîna koçberiya ji bo kar an xwendinê, û dibe ku koçberî her tim be bi mebesta niştecîbûnê li wî cihê nû.

Dibe ku koçberî rewa be li gorî belgeyên fermî ji dewleta ku wan dişîne û pêşwaz dike.. , dibe ku koçberiyek ne rewayî be jî, û koçberê ne rewa ew bi xwe hebûna wî bi gellek rengên nezagonî ye.. dibe ku kesek bi rengê ne rewa koç bibe, lê tevî ku dema niştecîbûn a wî bidawî bibe jî ew dikare li wê derê bimîne, û dibe yê koçber bi rengê rewa niştecî bibe, lê dê bi awayekî dijî zagon û pergala kar bike û dibe ku yê koçber bi rengê nezagonî niştecî bibe û bêyî ku rewşa xwe ya zagonî sererast bike.

Di piraniya şeweyên koçberiyê de gellek erênî û neyînî hene, jê pirsgirêkên tevlihbûnê û bilndbûna rêjeya tawanê û zewaca tevlihev û metirsiyên guhertina dîmografi di dewletên ku pêşwaziyê dikin, ev li kêlek ku ji şiyên koçberan sûdeyê digrin, her wisa dibin hêzek ji bo kar jî, yan parastinê ji koçberan peyda dikin ji bo sedemin mirovahî yan siyasî.

**Têgeha koçberî ya nûjen bi du hêmanên sereke ve girêdayî ye.. yê yekem, diyardeya dewlet a netewemendî û zagona regeznameyê û danîna sînoran di navbera dewletan**

**de ve, li gorî wê mabûnê, kesê ku ne ji niştecîyên dewletê be dikeve bin mercin destnîşankirî, ji ber dewleta netewemendî, komek neteweyî ligorîhev di hundirê xwe de dicvine û çaxa niştecîyên dewletin din koçî wê derê bibin, têye xuyakirin mîna destdirêjî li ser wê ligorîhevhatinê.**

Hêmanê duyem girêdayî kişandin û qewrandinê ye. Gellek pîvanên wê hene, di destpêkê de kişandin û qewrandina abûrî ji hêla cudabûn a li ser asta pêşxistin a abûrî di navbera dewletan de, û belavbûna bêkariyê di abûriyên cihêreng. Helbet ev tişt li kêlek kişandin û qewrandina civakî mîna pîrbûn a keysên serkeftina civakî û ji bilî alavên banga sorkirin a koçberiyê.. û ev hêmanên han hêsaniya çûnûhatinê û girêdana navneteweyî di rêya toreyên pêwendiyê re xurtir dike.

Hejmara koçberan li seranserê cîhanê dora 200 mîlyon kes in, li gorî serjimara rêxistin a koçberiyê ya navneteweyî sala 2005 an, 70.6 mîlyon jê li Awropa yê ye, û 45.1 mîlyon li Amerîka yê ye, 35.3 mîlyon li Asaya yê ye, bi vî awayî rêjeya koçberan di zik hev de 3% ji şênîyên cîhanê ye, û jin rêjeya wan 49.6% ji vê hajmarê ye..

Serjimar di vî warî de dide nîşan ku piraniya tevger a koçberiyê girêdayî kar e, lê rêjeya koçberên siyasî 7% ye ji hejmara giştî ya koçberan. Û koçberên ne rewa rêjeya wan di navbera 10% ta



IOM • OIM

gellek awayên koçberiyê ji hêla berjeng û taybetmendiyên wê hene, bi vî awayî:

- dibe ku koçberî hîlbijartane be, ango bi vîna kes an komê dibe, û dibe jî ku bi zorê be, bi destê hêzên derve di rêya çewsandin û tundê re.. û ji wêneyên wê, veguheztina 15 mîlyon kes ji parçezemina Afrîqiya yê di navbera sedsala 16 û 17 an de ber bi Amerîka yê de, qena mîna koleyan kar bikin, her wisa bêhtirî 37 mîlyon kes ji Çîn û Hindistanê di dema piştî sala 1830 an de hatin veguhestin ber bi Europayê û her du Amerîkanan de ji bo kar.



15% an de ye ji hejmara giştî.

Rêxistina serkêş di warê koçberiyê de, rêxistina koçberiyê ya navneteweyî ye, ku di sala 1951 de hatiye damezrandin, û 155 dewlet wekû endam cihê xwe tê de digrin, û 18 dewlet wekû çevdêr, bi awayekî eşkere dide xuyan ku ji armancên rêxistinê piştgirî û birêxistina koçberiyê ye, da rûmeta mirovahiyê biparêze û giş qezencê jê werbigirin, ew jî di rêya pêşkêşkirina xizmetguzariyan û rawêj û alîkarî di çareserkirinên pratîk de ji koçberiyê re.

Her wisa rêxistin di çar warên sereke de yên girêdayî ne

bi têkiliya di navbera koçberî û geşpêdanê de çalak e. Koçberiyê birêxistin dike, koçberiyê hêsan dike û koçberiya bidarêzor çarsêr dike. Bodceya rêxistinê di sala 2008 an de gihişt Mîlyar dolar, ji bo perezêdana programên xwe yê belavkirî li ser 430 nivîsgehên ku di kar de ne, û li bêhtirî 100 dewletî li seranserî cîhanê belavkirî ne.

Ew sedemên destnîşankirî û li kêlek pirbûna hejmarên koçberan li seranserî cîhanê, hişt ku pêwîstî bi danîna pergalek zagonî ji bo koçberiya navneteweyî hebe, ji ber azadiya tevger a welatîyan di hundirê herêma dewletê de tiştêkî asayî ye, berovajî koça ber bi dewletek din de.



Di rojevê de, peymanên mafên mirovan û yên rêxistinên navneteweyî yên girêdayî wê, didin xuyan ku koçberî " mafê veguhestinê " mafek bêsînor e ji kes re; (di bin giraniya koçberiyê de û danûstandina bi wê re û her wisa encamên ku dikevin ser milê wê).

Keresteya 13 an ji daxuyanameya cîhanî ya mafên mirovan, çûyîna nişteciyan ji welatê xwe qedexe ye, ev nayê wê wateyê ku ji yê ne nişteciyan wê re azadî heye ku derbasî herêma dewletê bibin, mafê çarenûsa koçberan vedigere dewletê li gorî bercewendî û şeweyê ewlehiya wê û di heman demê de jî parastina mafên koçberan.

Û tiştê ku xuya dibe piraniya peymanên navneteweyî yên girêdayî koçberiyê balê dikşînin ser mijara koçberî ya bi mebesta kar. Û ev di hundirê peymanê ku hate girêdan di rêya rêxistina kar a navneteweyî de ji bo koçberiya bi mebesta kar sala 1949 an û peymanê slal 1975 an, û peymanê sal a

1958 an( ji bo cîyewazbûna di bikaranînê de), û peymanê 1960 ji bo hevheziya keysan û bidawîkirina cîyewazî ya li beramberî karkeran heye..ya ku guhdaneke mezin da doza karkerên ku bi rengekî ne rewşa koçber bûne, ji ber dibe ku li pêrgî çewsandin û danûstandinek ne baş werin.

Lê mijara koçberiyê bi mebesta ku ji bo standina mafê penaberîya siyasî yan mirovahî be, ew têgeha wê ya taybet û serbixwe ta radeyekê heye, tevî ku dikeve bin xala çalakiya koçberiya navneteweyî. Di rêya taybedmendiya bingeheke ku penaberiyê li ser asta navneteweyî birêxistin dike, û di hebûna rêxistinên navneteweyî de yên ku guhdanê didin vî şeweyî ji şeweyên koçberiyê, nemaze di hundirê guhdana lezok de ji aliyê civaka navneteweyî ve bo dozên mafên mirovan, ku nerîtek navneteweyî çêbû li ser qedexekirina vegerandin a penaberan an koçkrina wan, ger sedemên penaberiyê hebin. Her wisa doza penaberiyê ji girîngtirîn doz in di hundirê birêkariya bilind de ji penaberan re ya



girêdayî neteweyên yekbûyî.

Di rojevê de, helwestên dewletan ji peymanên navneteweyî re yên girêdayî koçberiyê, di pileya yekemîn de bi bercewendiyên xwe yî abûrî û civakî û xwestekên ewlehî ve bandor dibe, û xuya dibe ew dewletên ku pêşwaziya penaberan dikin, mîna dewletên Awropî û Amerîka ya bakûr siyasetin cihêreng û demane li beramberî diyardeya koçberiyê birêve birin. Di dema berî sala 1985 an de ev dewlet koçberî ji bo xwe xurt dikirin, nemaze koçberiya kesên behremend û karker jî, li kêlek ku koçber mafên taybet di zagonan de jî bistînin. Lê di navbera salên 1985 û 1995 an de siyasetin hişk ji bo koçberiyê hatin holê, nemaze piştî diyarbûna aloziyan di navebera karkerên navxweyî û yên koçber de, û ji nîşanên herî xuya ser wî tiştî retkirina dewletên Awropî yên ku li ser peymanên neteweyên yekbûyî bo mafên mirovan ên koçber di sala 1990 de erê kiribûn. Lê piştî sala 1995 an dewleta ku pêşwaz bû danûstandinek hişk bi koçberiyê re birêve bir.. di bin siya ku bi siyaseta deriyên girtî de

hate bi nav kirin. Icar koçberiya rewa bû bi renekî hîlbijartane, li kêlek emzekirina gellek peymanên duyane û yên herêmî, da li hemberî koçberiya ne rewa û veğerandina koçberên ne rewa rawestin.

Aniha dewletên pêşketî yên ku pêşwaziya koçberan dikin, siyasetin hîlbijartane di hîlbijartina koçberan de birêve birin, ji hêla netewe û şîyan û temenên wan. Ji ber vê yekê dewletên Awropî û nemaze piştî tevlibûna dewletên Awropa ya rojhilat bo yekîtiya wan, dixwazin ku koçber ji hundirê dewletên yekîtiyê bin. Û ew qewarek ne hindik e. Ji ber hejmara koçberan di hundirê dewletên yekîtiyê de gihîştê 1.8 Mîlyon. Ango 85% ji geşbûna şênîyeyî.

Û piraniya van dewletan pergala KOTE bikar tînin, a ku rê dide pêşwazîkirina hejmarek destnîşankirî ji koçberan, û bi awayekî hîlbijartane. Li kêlek girêdana peymanin duyane yan herêmî bi dewletên tiranzît re yên ku di rêya wan re koçberên ne rewa derbas dibin bi mebesta damezrandin

a komîtin hevbeş bo çavdêriya sînoran û astengkirina hatina koçberan. Ew bi xwe çareseriyin ne biserketî ne, ji ber bingeha pirsgirêk a koçberiyê ya ji dewletên ne pêşketî re; ne tenê di warê abûrî de çareser nake, divaye ku rewşa wan baştir bikin, ew jî ger çareserkirin din werin pêşînyarkirin ku avayî bin li ser bingeha geşkirin a abûriyên dewletên ne pêşketî, û alîkariya wan ji bo ku pirsgirêkên xwe yî civakî çareser bikin, da karibin hinek aramiya siyasî biparêzin a ku rê li pêşîya karê geşmendiyêke giştî vedike.

Werger: Xoşman Qado



# Nakokî di navbera pêdîvî û bikaranînê de

Ciwan Pîr

Mêjoya Hişmendî ya mirovahiyê, nakokî dida xuyan, mîna yasayekê ku hebûna wî bi pêş de dibir. Û ji ber ji hêla her kesî ve tê zanîn ku jiyana berdehame, rojên xwe bi nakokiyên cuda dest pê dikirin, hem di naverok û hem jî di şeweyê xwe de; li ser hemu astên civakî û yekdayî.

Hişmendiya mirov bû ya ku rê da ber naskirina, Xêr û Şer, erênî û neyênî, hebûn û nebûn, nerîn û nerîna yê din. Her wisa di rêya wê re hebûnek xuristî û tekezîrî ji nakokiyê re nas kir. Bîrdozên ku Afirand, wateyek da hebûna wî, û Vîyana wî yê hişmend çesipand, wek Hilbijartina Xuristî û veguheztina wî ji pergaleke civakî re ber bi yeke din ve, û ji pêbendên zikmakiya xwe rizgar bû.

Anthropologya mirov di nakokiya wî ya Seretayî de bi xuristê re (Surişta Manê), wek aliyek ji vê nakokiyê re xuya dibû. Lê ji ber ku xwedî viyaneke hişmend bû, têgeha nakokiyê ya li himber xuristê, bû rêyek ji derxistina Yasayên ku Kontrola wê xiste dest xwe.

Lê nakokî wek yasa ku ji hebûna mirov nayê veqetandin, berê xwe guhert û hat li himberî Mirov bi xwe rawestiya. Gelo dibe ku ev tiştên di navbera mirov û birayê wî de dibin, vê yasayê bidin ber rûyê xwe? Dibe ku Mana yê bi Hêztir bibe Pêwîstiyêke bêyî ku tu rêzgirtinê ji Sinc û Pirensîpan re bikin?

Wek ku tê bi nav kirin (Nakokiya Şaristaniyan). Dema ku em li vê dîrokê binerin, gelek kiryarin bê sinc tê dîtin, ser çî astê be. Ji aliyekî din ve,

Şaristaniya Mirovahiyê ji aliyê teknîk, teknolya, wêje û hunerî. Bi vî awayî mirov pîvanên pêşketina xwe anî holê. Her wiha ew Mijarên ku bi şeweyên xwînawe dijberî pêre dikir, hin bi hin regekî şaristanî distend.

Pêşketina keresteyî, raman û giyanî, berî her du cengên cihanê, bûbû hêzeke nû ku bi coş dixwest hebûna xwe bîne holê. Lê pîrbûna navendên van hêzan û belavkirina wê yê Geographic, bû sedema ku bi şîwazeke tund xwediyê van hêzan serî ji xwe re kişandin. Wek mînak: Li rojhilata Ewropayê bîrdozeke Total bû, û li rojavayî wê Netewî, Nijadperest, Şofoînî, Şepêlin Rast Xweparêz bû. Lewra ew hêz li pêrgî hev hatin, her du şerên cihanî şeweyê vê nakokiyê dinimûne, û bû sedema kuştin a bêhtirî 60 mîlyon kes û wêrankirina bajarin ji bingehe de, ev ji bilî pejilandina Îkolojiyê bi çekên kîmyawî û atomî ku bi awayekî bê sînor dihat bikaranîn.

Paş re, navendên xwedî hêz gihan şewazîn nû, ku naveroka nakokiyê guhertin. Mînak, hevparîna desthilatê bi gelê xwe re, û vejîna rijêmin demokratîk.

Ji ber ku bingeha hişmendî li cem mirov bi gelemperî yek e, gerek gelin din jî di danûstandina xwe bi têgeha nakokiyê re pêşkevin, şewê û naverokên wê bugherin.

Dema ku mero bala xwe bide xuyîtiya mirov î rojhilatî li gorî pîvana demê, em dibînin hin ji wan pîrsgirêkan ev demeke ku berdehame, jixwe hin din rengê bêdawayî standine. Bê ku tu



guhertin, ne di naveroka xwe de û ne jî di şeweyê xwe de werin pêk anîn.

We ku tê zanîn mirov xwedî viyaneke hişmend e û dikare naverok û şeweyê nakokiyê bughere. Ango ew viyan li cem me peyda nabe?

Vîn û guhertin e. Ji ber ê ku ber bi guhertinê ve naçe, ew viyan li cem wî peyda nabe, da ku wê guhertinê pêk bîne.

Pîvanin demê ji wan pîrsgirêkan re bi wî rengî, berdehameya surişta nakokiyê nîşan dide, bêyî viyaneke hişmend ji gurtinê re. Nakokiyê bi



van rengan xwe berdewam dikir di rêya dezgeh an civakin ku ev naverok derdibirîn. Dibe ku ew sedem bûn ên ku viyaneke himşmend ji guhertinê re peyda nekir, û roleke berûvaj ji Stratîjîya damezirandin a xwe re stand. Ji dêlva ku ev dezgeh bibn destek ji bo çareserkirin, bidawîkirina mîlmilandinê û avakirinek nû ji têgeha nakokiyê re, bû rêbendek li himberî vê pêşketinê.

Mirovê hemdem- ê ku bingeheke nû di hinavê xwe de hilgirtiye, li bin guhê dîwarê paşmayî yê dezgehî rizyayî dikeve- hişt ku tevgera wî pûç bibe, û dûrbûnek xist di navbera wî û Rasteqîneya wî de.

Hilwişandina wî dîwarî, pêwîstiya şoreşeke yektane dida xuyan, ku jê destpê bike ji bo xweyîtiya xwe pêk bîne.

Ji bo ku şoreş di rêça xwe yî rast de be, divaye şewaz û naverokî nû ji van pîrsgirêkan re werin danîn, da ku di nav re çareseriyên û pêkanîna yekem gav di avakirina pergaleke nû û guhertina têgeh a nakokiyê di hawîr dora xwe de pêk bîne. Ji ber dezgehên civaka sîvîl desteke ji bo derxistina mirov ji çirava wî ya dîrokî ye. Ew destekeke nû ye, ku ji komkirina mirovan re nîşan dide, bi peydakirina yasayin ku rola mirov tê de hebe, bêyî çav şikandinê. Wisa viyanek bê hempa tê pêkanîn ku ji hinavê mirov derdikeve, ne ji derveyî wî tê çêkirin.

Ji ber di xala destpêkê de, pêwîste ku ew mirov, xweyîtiya xwe nas bike, bêyî ku têkeve bin baskê deshilatdarekê ku berê ew çêdikir.

Ev şoreşên ku li dar dikevin, bi xwe tezekirineke ji hilwişandina van dîwaran re ye. Bi vî awayî kesayetîya xwe yî yektane ava dike. Rojev wisa dibe neynikek ji hebûna wî ya birra re.

Berdwamî- bi vî rengî di vê qonaxê de di nerîna me de - hêvîyeke nû ye ji bo pêşxistin û veguhertina cûreyên nakokiyê li cem mirov, û rengkirina têgeha nakokiyê bi rengê wê yê mirovane.




## Çalakî

Li bajarê Amûdê rêxistina (Me & You) ya geşpêdanê, şeş kargehên rahênanî bo perwerdeya sivilane ji zarokan re lidar xist, 160 zarok ên temên wan di navbera 7- 12 salî de jê sûd wergirtin, armanc jê afirandina derfetek hêvî biçûk ji zarokan re di rêya beşdarbûna wan di listikin taybet de bû, her wisa ew fêrî bê çawa li ser qaxez û caw birsimînin kirin.



Nivîsgeha Serêkaniyê ya navenda Biratî ya ji bo dîmokratîkê û civaka sivil, bi serpirîştîya navendê û beşdarbûna kombûn a parêzerên Serêkaniyê, yê mîna hevbeş û cêbecikîrîner ji kampaniya lêborînê re, simînerêk giştîgoyane di bin navê (Serêkaniyê bajarê lêborînê) de lidar xistin, di çarçîva kampaniya ( li hev bibûr in da aşî çêbibe) de ku 19 ciwan ji hemû pêkhatayên bajarê de beşdar bûn.



Komeleya Şaoşka û navenda Biratî, navendek ji bo fêrkirina jinan dirûn û nexşekirinê vekirin, di bin navê (çalakirina jinê) de, ji armancên vê navendê fêrkirina hejmarek ji jinan bo dirûn û nexşekirinê, û amadekirina wan bo paşerojê, û her du komele hewil didin bo peydakirina bazarek ji firotina berhemên vê navendê re.



Li navenda komeleya Subartu, komeleya Aso ya di jî tundûtîjîya li ser jinê, simînerêk di bin navê :( Jinên ku di kertê taybet de kar dikin, wekû nimûne bernexweşan) de.



Rêxistina Mafên Mirovan-MAV, kargehek di bin navê ( ber bi civakek ewle û bi aşî hevjiyan bikin ve) de pêk anî, 20 çalakvan ji xurt û keç beşdar bûn, û ji hemû pêkhatayên bajarê Qamişloyê.



Navenda civak a sivil û demokratîyê (CCSDS)- nivîsgeha Qamişloyê- kargehek bo rêvebirina sivilane ji Tevgera Ciwanên Kurd (T.C.K) re pêk anî.